# Naveroka


- Kar, fêrbûn û Perwerdehî 2
  - Kar 2
    - Min ê kengî destûra karkirinê hebe? 2
    - Bifermînasbûna bawernameyên pêşeyî 2
    - Maf û erkên min 3
    - Destmizda herîkêm 5
    - Bac û vegera bacê 5
    - Ez çawa kar bibînim? 5
    - Fêrbûna kar 6
    - Şêwirîn û yarmetî 6
    - Daxwaz 7
  - Fêrkariya Pîşeyî 8
    - frêkariya pîşeyî li Kargehê 8
    - Tehemilbûna fêrkariyê (Ausbildungsduldung) 8
    - Lêgerîna li kurseke fêrkariyê 9
  - Perwerdehî 9
    - Qonaxên perwerdehiyê 10
    - Dabînkirina aborî ya perwerdehiyê 11
    - Şêwirîn û peydakirina riya Perwerdehiyê (Studienorientierung) 12
    - Bifermînaskirina belgeyan 13

# Kar, fêrbûn û Perwerdehî

## Kar

### Min ê kengî destûra karkirinê hebe?

Te destûra karkirinê di sê mehên destpêkê piştî navnivîsandina xwe tuneye.

Li gorî Rewşa Mayînê jibo te qanûnên cûrbicûr hene:

- Penaxwazên ji welatên ewleh ên jêderk (Albanya, Bosnî, Hersek, Xena, Kosovo, Makedûniya, Montenegro, Senegal û Sirbiustanê bi daxwaza Penabertiyê piştî 31ê Tebaxa 2015an)  qedexetiya karkirinê hene, yanî destûra xwe ya karkirinê tunene.
- Penaberên bifermînasbûyî, kesên ku rewşa wan a penabertiyê heye û kesên ku piştevaniya pêreyî werdigirin bi tamî dikarin têkevin Bazara Kar: Tu dikarî derdem dest bi karkirinê bikî û hewcetiyeke te bi destûrê tuneye.
- Penaxwaz, penaber û kesên tehemilkirî (Duldung) (bi belgeya naskirinê an Destûra Mayînê) divê daxwaza Destûra Kar bidin Rêveberiya Welatiyên Biyanî. Jibo vî karî divê karekî taybet hebe. tu dikarî agahiyên pirtir livirbibînî.

Rêveberiya welatiyên Biyanî dikare Qedexetiya Karkirinê bide ser kesên tehemilkirî (duldung), wek mînak ji ber vê yekê ku te jibo terikandina welêt (nemaze raberkirina belgeyên naskirinê) soza xwe ya hevkariyê binpê kiriye.

Rêveberiya welatiyên Biyanî bi awayekî normal hewcetî bi destûra Ajansa peydakirina kar a Federalê heye. Ev rêveberî rewşa kar vedikolîne. Karê demkî jî piştî piştrastkirinê pêkan e.

### Bifermînasbûna bawernameyên pêşeyî

Bifermînaskirin an nirxandina bawernameyên perwerdehiyê yên ji derveyî welêt dikare jibo têketina nav bazara Kar alîkar be.

Girêdayî bi pîşeya te, gelek rêxistin berpirsê bifermînaskirina bawernameyan in.

Tu dikarî jibo bifermînasbûna van bawernameyan bi riya Înternetê li malpera anerkennung-in-deutschland.de (Ev agahî bi 11 zimanan hene) an bi têkiliya tev telefona 03018151111bikevî tevgerê.

Belgeyên cûrbicûr jibo selimandina hêjatiyê hewce ne. Eger daxwaza te were piştrastkirin tu yê wî çaxî „Peyama Bifermînasbûnê“ werbigirî.

Karê herî baş ev e ku demeke şêwirînê li Navenda Şêwirîna Penaberan li nêzikî xwe bigirî. Şêwirîna Bifermînaskirinê bêpere ye û eger te pîşeyek li derveyî welêt hêvosiye û dixwazî li Almanyayê di vê pîşeyê da bixebitî, alîkariya te dike.

### Belge

Jibo pêkanîna Şêwirînê divê belgeyên jêrê digel te hebin:

- Belge (Hevrê digel wergera belgeyan, heke bi te ra hebin)

- CV (Resûme)
- Eger te pêştir jibo bifermînaskirinê daxwaz daye, name û daxuyaniyên rêveberiyan
- Hin belge ji karên te yên raborî
- Nasname an Pasport an Destûra Mayînê

## Şêwirîn

**Navenda Şêwirînê jibo Pêşxistina Pîşeyê (BBE) ya Navenda fêrkirina mezinan a navçeya Viersen'ê (VHS)**
Willy-Brandt-Ring 40, 41747 Viersen
kreis-viersen-vhs.de/beratung/berufliche-entwickl...
02162/93480
bildungsberatung@kreis-viersen.de

**Aliyê bersivdêr:**
Neumann, Mechthild
Hanraths, Eva

**IQ-Netzwerk NRW**
DGB Bildungswerk Bund e.V.
iq-netzwerk-nrw.de
Beqaj, Orjana
0171/2031713
orjana.begaj@dgb-bildungswerk.de
Şêwirîna Online

## Agahiyên pirtir derbarê mijarê:

- Agahî ji Ajansa Peydakirina Kar
- Pêşniyar jibo kesên xwedan bawernameya Hêjatiya Pîşeyî ya derveyî ji IQ-Netzwerks NRW
- Portala Anabin jibo haydariya ji biferînasbûna Bawernameyên Perwerdehiyê

### Maf û erkên min

Te wek hêzekî kar ê ku meaşê werdigire, hin maf û erk hene. Û bi giştî ev di girêbesteke kar da tên eyarkirin. Ev girêbest bi giştî bi awayê nivîskî ji te ra tê raberkirin. Girêbesta kar dikare bi awayê devkî jî be. Girêbesta kar tiştê ku divê pêk bînî û tiştê ku di berdêlê da tu yê ji xwediyê karê xwe werbigirî, eyar dike. Çarçova şert û mercan jî di vê girêbestê da hatiye qeydkirin (wek mînak):

- Destpêka girêbesta kar
- Meaş (destheq)
- Cihê karkirinê
- Cûre û heyama çalakiyê
- Hejmara rojên betlaniyê û qasa demên Bêhnvedanê
- Pêwîstiyên ku divê di rewşa betalkirinê da bên berçavgirtin
- Heke heye, dawiya Girêbesta Kar (derbarê têkiliyên karî yên demkî)

Destmizda te bi giştî li gorî qasa wan saetam (demjimêr) e ku tu dixebitî (destmizda saetî). Li Almanyayê Destmizdê Herîkêmbi awayê qanûnî tê sepandin. Ev destmizd, pereyê herîkêm e ku divê jibo saeteke xebatê were wergirtin.

Saetên xebatê ji aliyê Qanûna Saetên Xebatê (ArbZG) va tên eyarkirin. Dema xebata asayî (rojane) herîpirr 8 saet e. Ev heyama demî dikare heta 10 saetan were zêdekirin, lê divê ji nû va hevseng bibe (di heyama nîvsalê da).
Dema bêhnvedanê jî tê eyarkirin. Dema Bêhnvedana te piştî 6 heta 9 saetan xebata bêrawestan tê holê. Di vê heyamê da divê herîkêm 30 deqîqeyan bêhna xwe vedî. Eger te zêde ji 9 saetan kar kiriye, divê herîkêm 45 deqîqeyan bêhna xwe vedî.

Te destûr heye ku herî betlaneyan. Di heyama betlaneyên qanûnî (herîkêm 20 roj di salê da), destmizd ji te ra tê dayîn. Di girêbesta xwe ya karî da, tu dikarî qasa betlaneya ku mafê te ye, bibînî. Eger di heyama betlaneyên xwe da nexweş bibî, dema nexweşiya te wek dema betlaneyê nayê hesibandin. Tevî vê yekê, tu divê guwahiyeke bijîşkî bo wan raber bikî.

Eger tu nexweş bûyî, cihê karê xwe ji vê yekê haydar bike. Pêwîst nake ku sebeba nexweşiyê were ragihandin. Eger zêde ji 3 rojan nikarî biçî cihê karê xwe (bala xwe bide ser dawiya hefteyê), divê guwahiya nekarîna bo kar ku bijîşk dide te, raber bikî. Destmizda te di heyama nexweşiyê da hema wisa dê were dayîn. Xwediyê kar destmizda 6 hefteyên destpêkê dide te. Piştî vê heyamê, tu yê sîgortaya nexweşiyê ji şirketa sîgortaya xwe ya dermanî werbigirî. Ev sûdên nexweşiyên beranberî sedî 70 ji destmizda te ya xalis e, lê zêde ji ssedî 90 ji destmizda te ya xalis nîne.

Tu wek jineke ducnaî piştevaniyeke taybet li hemberî derxistina jmi kar werdigirî. Ji bilî vê yekê, betlaneya zarokanînê ji 6 hefteyan pêş û heta 8 hefteyan piştî zarokanînê tê dayîn. Di vê heyamê da tu neçar nînî ku kar bikî û hema wisa tu yê meaşa xwe werbigirî.

Piştî zarokanînê tu dikarî betlaneya dêbavan bi kar bînî. Ev yek hem jibo dêbavan û hem jibo dayîkên ku di malekê da digel zarokê xwe dijîn, rast e. Di vê heyamê da pêwîst nake ku ragihînî. Tevê vê yekê, tu yê tu meaş û destmizdekê ji xwediyê karê xwe wernegirî. Tu dikarî jibo alîkariya mesrefa dêbavan, ku ji aliyê dewletê va bo te tê dayîn, daxwaz bidî.

Her du sergêr (dayîk û bav) bi giştî Alîkariya Mesrefa Dêbavan bi qasî 14 mehan werdigirin. Ev babet nikare di navbera dêbavan da were parvekirin, bi mercê ku ev her di miqatebûna ji zarok da beşdar bin, yanî di heyama betlaneyê da, dêbav daxaswza tu karekî pirrdehat nekin.

Yek ji dêbavan dikare herîkêm 2 û herîpirr 12 mehan betlaneyan dêbavan bi kar bîne. Eger tenê dayîk an bav jibo betlaneya dêbavan daxwaz bide, herîpirr dikare 12 mehan betlaniyua dêbavan bi kar bîne. Alîkariya mesrefa dêbavan bi qasî sedî 65 ji derhata xalis a te ye, lê herîkêm 300 Euro di mehê da ye.

Girêbesta kar dikare di şert û mercên taybet da were betalkirin. Hegerên vê yekê dikarin têkildarî Kar û pîşeyê (rewşa aborî ya xerab a Kompaniyê) an têkildarî liv û tevgerê be (eger te sozên xwe yên karî yên di girêbesta kar da cih neanîbin). Eger tu dixwazî ku wê bi daxwaza xwe betal bikî, şertên qanûnî yên Hişyariyê tên sepandin. Tu dikarî di girêbesta xwe ya kar da derbarê vê yekê bixwînî. Betalkirina girêbestê ji aliyê rêveber va an ji aliyê te bixwe va divê nivîskî be. Betalkirina devkî pêbawer nîne.

Tu dikarî agahiyên pirtir li malperên jêrê bibînî:

- Yekîtiya Karkerên Ewropî (European Workers Union)
- Kanala Fêrkariyê ya DGB'ê

- û malperên Yekîtiyên Kargeriyê

## Destmizda herîkêm

Li Almanyayê destmizda herîkêm bi awayî qanûnî heye. Destmizda herîkêm di saetekê da 9.50 Euro ye. Ev pere berdewam zêde dibe. (Ev pere heta 1ê Tîrmeha 2022an dê bigihêje 10,45 Euroyî.)

Eger kedkar zêdetir ji girêbesta lihevkirî bixebitin, destmizda herîkêm nabe ku kêmtir ji wê be.

**Destmizda herîkêm van babetan nagire ber xwe:**

- Xortên bin 18 salî bêyî fêrkariya Pîşeyî
- Fêrxwazê Kar
- Bêkarên demdirêj piştî bidawîhatina heyama Bêkariyê û di şeş mehên destpêka karkirina xwe
- Fêrxwazên kar di cûreyên fêrbûnê da (Fêrbûna kar a têkildarî dibistanê an perwerdehî an Fêrbûna kar jibo peyakirina riya pîşeyî heta sê mehan)
- Çalakiyên xwebexş

## Bac û vegera bacê

Divê hûn li Almanyayê bac bidin hatina xwe. Heke hûn kardar in, hûn ê mîqdara neto ya meaşê xwe ji kardêrê xwe bistînin, ku tê vê wateyê ku bacên we berê hatine veqetandin. Ger tu bi xwe kardar î, divê tu bi xwe bacê li ser hatina xwe bidî.

## Numreya nasnameyê ya bacê

Nasnameya bacê jimareyek 11-reqemî ye û ji bo baca hatinê tê bikar anîn. Cihê kar vê hejmarê hewce dike. Ger ev hejmar di belgeyên we de tune be, hûn dikarin bi kesane ji daîreya qeydkirinê an jî bi nivîskî ji Daîreya Bacê ya Federal daxwaz bikin.

Heke hûn di vegerandina bacê de hewceyê alîkariyê bin, çêtirîn e ku hûn bi komeleya baca hatina xweya herêmî re têkilî daynin. Ger pirsên we yên din hebin, daîreya bacê jî dikare alîkariya we bike.

## Ez çawa kar bibînim?

Ger destûra xebatê ya we hebe, hûn dikarin bi xwe li karekî bigerin.

Pargîdaniyên ku li karmendên nû digerin " **reklama kar** " dinivîsin.
Hûn dikarin van li ser malperên pargîdanî, rojname an jî li ser Înternetê bibînin.

**Pêşniyarên kar li ser înternetê:**

- Danûstandina kar a ajansa kar
- Danûstandina kar " Li Almanyayê çêbike "
- Danûstandina kar " Karker " bi taybetî ji bo penaberên ku li kar digerin

Daîreya kar dikare di lêgerîna we ya kar de piştgirî bide we.

**Ajansa kar Viersen**
Remigiusstraße 1, 41747 Viersen
ajansa karî.de
02151/921010
Duşem heta Înê 8.00 ber 18.00
Viersen@arbeitsagentur.de

Ger hûn jixwe xerîdarek navenda kar in, navenda weya kar a herêmî dikare li ser lêgerîna we ya kar şîret bike.

### Fêrbûna kar

Jibo bidestxistina Kar an Fêrgehekê gelek ji kompaniyan çaverêtiya fêrbûna kar hene. Ew dixwazin diyar bikin ku gelo tu jibo vê mewqiyê guncanî an na. Bi awayekî normal ji 2-4 hefteyan dem dibe, carinan jî heta 3 mehan û tu destmizdek nayê dayîn.

Eger heyama fêrbûna kar zêde ji 3 mehan bidome, xwediyê kar divê destmizda herîkêm bide te.

Ev yek girîng e ku beriya destpêkirina Fêrbûna xwe, navenda Kar (kesên xwedan destûra mayînê) an Rêveberiya Welartiyên Biyanî (kesên ku di pêvajoya wergirtina mafê mayînê ne û kesên di rewşa tehemilkirin anku Duldung'ê da ne) haydar bike:

Brüggen, Grefrath, Kempen, Niederkrüchten, Nettetal, Schwalmtal, Tönisvorst, Viersen, Willich

## Lêgerîna kursên Fêrgeh an fêrbûna kar

Li rûpelên jêr tu dikarî fêrgeh an kursên fêrbûna kar bibînî:

Danûstandina Kar Ajansa peydakirina Kar

Bûrsa kursên fêrbûna kar a Odeya Pîşe û Ticaretê (IHK), lêgerîna li kursa Fêrbûna kar a Odeya Pîşeyên destî an Bûra Fêrbûna kar a Odeya Pîşe û Ticaretê li App'a Integreat'ê.

### Şêwirîn û yarmetî

Enistîtûyên jêrê li navçeya Viersen'ê di warê peydakirina kar da dê alîkariya te bikin:

**Jobcenter / BLZ Brüggen/Nettetal**
Poststraße 19, 41334 Nettetal

**Jobcenter / BLZ Kempen/Grefrath/Tönisvorst**
Arnoldstr. 13c, 47906 Kempen

**Jobcenter / BLZ Schwalmtal/Niederkrüchten**
Hospitalstraße 16, 41366 Schwalmtal

**Jobcenter Viersen**
Am Schluff 18-20, 41748 Viersen

**Jobcenter / BLZ Willich**
Gießerallee 8, 47877 Willich

**Têkiliya digel hemî navendên kar /BLZ:**
kreis-viersen.de
02162/2661100

**Agentur für Arbeit Krefeld/Viersen**
Philadelphiastr. 2, 47799 Krefeld
arbeitsagentur.de
02151/921010
Krefeld@arbeitsagentur.de

### Daxwaz

Eger dixwazî ku kurseke fêrbûna kar an Kar li Almanyayê dest pê bikî, divê bi awayê nivîskî daxwaz bidî.
Di pirraniya deman da, kes daxwaza xwe ji kompaniyekê ra raber dikin, ji ber ku ev kompanî reklama xwe ya karî li Înternetê an Rojnameyê weşandiye. Ev tê vê wateyê ku ev kompanî li dû kedkarên nû ye. Li agehînemya Istîxdamê da hatiye ku cûreya kar an Fêrkariyê çi ye û kompaniyê çi çaverêtiyek ji kedkar  heye. her wiha dibêje ku li ku û çawa divê daxwaza xwe bidî.

Eger meyl û daxwaza kompaniyê li ser te hebû, pirrî wextan tu yê jibo hevpeyîvînê werî vexwendin ku li wir bi xwe bidî nasandin. Ji kerema xwe têra xwe demê terxan bike û piştrast be ku di dema xwe da diçî jibo hevdîtinê. Baştir e ku ji pêş va xwe jibo hevpeyîvînê amade bikî û lêzanînên girîng derbarê kompaniyê bi dest bînî. Seredana malpera wê Kompaniyê bike û dîroka Kompaniyê bixwîne û bila haya te ji berhem an xizmetên wê hebe. Eger li ser wext jibo biryara hevdîtinê biçî û di heyama hevpeyîvînê da bi başî bersiva pirsan bidî, ev yek nîşana meyl û meraqa te jibo fêrbûnê an karkirina di wê kompaniyê da ye.

## Daxwazek bi giştî pêkhatî ji sê beşan e:

**Nameya Hevrê:** Di nameya xwe ya kesane da bi kurtî xwe bide nasandin û hegera guncanbûna xwe jibo wê cîgeha karî bibêje. Wek mînak tecrubeyên ku te pêştir li welatê xwe hebûne, şirove bike. Derbarê vê kompaniyê lêzanînên pirtir bi dest bîne û şirove bike ku çima dixwazî li wir bixebitî. Nameya te ya sereke divê di rûpelekê da be. Nameya xwe wajo bike. Gelek mînak û alîkarî li Înternetê hene. Xala girîng ev e ku tu tenê rastiyan şirove bikî. Nameya te divê ku li gorî te û mewqiya te be.

**Rezûme (CV):** Rezûme anku CV'ya te tecrube û ezmûnên te vedibêje û weke xişteyeka mezin nijyarmend dike. Tê da binivîsse ku ji kengê û heta kengê te li kîjan kompaniyî kar kiriye. Cihê fêrbûna kar an perwerdehiya xwe binivîse. Binivîse ku te li kîjan xwendingeha bilind perwerdehî dîtiye û dîplomaya te çi bûye. Hewcetiyek tune ku wêneya xwe di rezûmeyê da dayînî, lê gelek ji kompaniyan vê yekê dixwazin.

**Bawername û Belge:** Girîng e ku kopiya bawernameyên xwe bişînî (Bêyî esla wan!). Bawernameya te ya Perwerdehiyê ji Xwendingeh an Zanîngehê û belge û jêderka te ya karî ya berê. Bawername divê bi zimanê almanî an Inglîzî bin, gerna divê werin wergerandin. Tu her wiha divê belgeyên fêrbûna kar, an fêrbûna têkildarî karê xwe an Bawernameya xwe ya Kursa zimanê almanî bişînî.

Reklama Istîxdamê şêwaza daxwaza te nîşan dide. Ji kerema xwe bi baldarî bixwîne.

**Nivîsandî:** Peldankeke daxwazê bikire û Name, Rezûme (CV) û bawernameyên xwe tê da dayîne. Piştra daxwaza xwe bo navnîşana nivîsandî li agehînameya Istîxdamê bişîne.

**E-Mail:** Gelek ji daxwazan aniha bi Email'ê tên şandin. Nameya sereke, Rezûme û Bawernameyênm xwe li nav fayleke PDF dayîne û wan bi riya Email'ê bişîne. Li Email'ê, nivîseke kurt jibo kesê ku daxwaza te werdigire, binivîse.

**Online:** Kompaniyên mezin xwedan malper in û divê ji wir daxwaza xwe bişînî. Li wir divê adresa Email'a xwe tomar bikî û piştra tu dikarî daxwaza xwe bo wir bişînî.

💻 Tu dikarî babetine sûdmend derbarê daxwazê li planet-beruf.debibînî.

💻 Europass Portaleke serxet a pirrzimanî (zêde ji 20 ziman) ye ku alîkariya koçberan dike da ku pisportî û zanista xwe bidin ber raya giştî. Ev portal îmkana bêpere ya pêkanîna amûra serxet (online) a bawernameya ziman an Rezûmeyê raber dike. Her wiha tu yê babetine girîng jibo nivîsîna daxwazeke baş li Europass'ê bibînî.

### Temrînên ziman

💻li Portala Hînbûnê ya VHS'ê ya bi navê "Ich will Deutsch lernen" û li ser malpera Enistîtûya Gote ya bi navê "Deutsch für dich" tu yê hin temrînan di warê Daxwazê bibînî û bi giştî derbarê Cîhana Kar. Bi vê riyê, tu yê hin tiştan derbarê Cîhana Kar fêr bibî û zimanê te yê almanî dê baştir bibe.

## Fêrkariya Pîşeyî

### frêkariya pîşeyî li Kargehê

### Frêkariya pîşeyî li Kargehê = Fêrkariya pîşeyî ya ducûre

Derbarê  Fêrkariya li Kargehê , divê em bêjin ku ev fêrkirin hem li kargehê û hem jî li dibistana pîşeyî pêk tê. Ev kursa fêrkariyê di navbera du heta sê sal û nîvan dem dibe.

Jibo kemilandina Fêrkariya Ducûre te hewcetî bi Kargeheke fêrkariyê, heye ku girêbesta fêrkariyê digel te girêdide. Tu yê piştra ji vê kargehê meaşa fêrkariyê weerbigirî.

**Girîng**: Eger tu di halê derbaskirina qonaxên Penabertiyê yyî an heke di rewşa Duldung'ê (tehemilkirin) da yî, divê girêbesta fêrkariyê bo Rêveberiya welatiyên biyanî bişînî.

Wek mînak, tu dikarî mewqiyên vala yên fêrkariyê li Mekanên Fêrkariyê Odeya Pîşeyên Destî (IWK) an jî Bûrsa Fêrkariyê ya Odeya Pîşe û Ticaretê (IHK) peyda bikî.

💡 Tub dikarî Fêrkariya li Kargehê bi riya **Alîkariya mesrefê ya Fêrkariya Pîşeyî (BAB)** ji hêla aborî va dabîn bikî. Tu dikarî agahiyên zêdetir li vir bibînî.

### Tehemilbûna fêrkariyê (Ausbildungsduldung)

Kesekî tehemilkirî yê fêrkariyê an fêrxwazekî kar ku qonaxên wî yên penabertiyê bi dawî bûne û daxwaza wî ya penabertiyê hatiye redkirin Tehemilbûna Fêrkariyê

(Ausbildungsduldung) werdigire. Ev tehemilbûn  di heyama kursa fêrkariyê da tê dayîn û piştî bidawîhatina serketî ya fêrkariyê bi qasî 6 mehan jibo lêgerîna li kar tê dirêjkirin.

Piştî bi dawîhatina fêrkariya pîşeyî, kesên xwedanmerc ê biyanî xwedan **Mafê Qanûnî** ye ku li gorî Beşa 19, benda 1a ji Qanûna Mayînê, di rewşa ku bikare karekî hevseng li gorî fêrkariyê bi dest bîne, dê destûra mayînê werbigire. Pêwîstî ev in: Ewlehiya meaşê ya serbixwe, neketina ber darizandinê û hebûna pasporta pêbawer a welêt.

💻 Tu dikarî agahiyên zêdetir li vir bibînî. Tu dikarî bernameya dayîna Tehemilkirina fêrkariyê li vir daxînî (.doc).

### Lêgerîna li kurseke fêrkariyê

Eger tu hîn nizanî kudixwazî kîjan kursa fêrkariya pîşeyî bişopînî, digel ajansa Peydakirina Kar bişêwire:

**Agentur für Arbeit Krefeld/Viersen**
Philadelphiastr. 2, 47799 Krefeld
💻arbeitsagentur.de
📞02151/921010
Krefeld@arbeitsagentur.de

💻Tu dikarî hin agahiyan (bi zimanê almanî) jibo fêrkariya pîşeyî li ser vê malperê bibînî: berufenet.arbeitsagentur.de.

💻Tu dikarî agahiyan bi zimanê erebî, almanî, inglîsî û fransî derbarê bijartina kar, daxwaz û ezmûnan jibo naskirina xalên xwe yên hêzê li ser vê malperê bibînî: planet.beruf.de.

Tu dikarî mekanên fêrkirinê an fêrbûna kar li portalên Odeya Bazirganî û Pîşeyan (IHK), Odeya Pîşeyên Destî (IWK) li Portala App'a Integreat'ê bibînî.

## Hêjatiya têketinê (EQ)

Bi erêkirina ajansa peydakirina karû Rêveberiya Welatiyên Biyanî, her wiha tu dikarî peydakirina kar a **ji 6 heta 12 mehan** li kompaniyekê derbas bikî û piştra biçî kurseke fêrkariyê (Hêjatiya têketinê (EQ)). Bi vî awayî tu dikarî bi awayekî pîşeyî û pratîkî digel kursa fêrkariyê nasyar bibî û te û xwediyê karê te , we ev derfet heye ku hevdu nas bikin.

Tu dikarî vê broşûrê (pdf) ji kompaniya ku dixwazî li wir kar fêr bibî, ra nîşan bidî: Hêjatiya têketinê – agahî jibo xwediyên kar û pîşeyê

## Alîkariyên hevrê digel fêrkariyê (abH)

Eger di dema niha da tu di halê fêrbûnê da yî an eger te Hêjatiya Têketinê (EQ) heye, eger te hewcetî bi piştevaniya zêdetir di fêrkairya xwe da heye, xwediyê karê te dikare jibo alêkariyên hevrê digel fêrkariyê serdana Ajansa Peydakirina Kar bike.

Alîkariyên hevrê digel fêrkariyê – Hêjatî jibo Xwediyên Kar (pdf)

### Perwerdehî

## Lêzanînên giştî

Gelek kursên perwerdehiyê li Almanyayê hene. Her wiha cûreyên zanîngehan hene:

- Zanîngeh (çiqa zanistî)
- Zanîngehên (pisporî) (zanistbingeh)
- Zanîngehên ducûre (gelekî zanistbingeh)
- Zankoyên huner, fîlm û Mûzîkê (jibo pisportiya hunerî)

Zanîngehên dewletî û xusûsî hene. Kuwalîteya zanîngehên taybet û xusûsî dibe ku teqez baştir nebe, lê pirraniya wan pereyekî pirr werdigirin.

**Malperên sûdmend:**

💻 Hochschulkompass (Hemî kurs û zanîngehên Almanyayê)

💻 Deutscher Akademischer Austauschdienst (DAAD – Gişt qonaxên Perwerdehiyê li Almanyayê)

💻Study in Germany (Lêzanîn jibo penaxwazan)

💻 Ajansa peydakirina Kar (bi Peydakirina riya Perwerdehiyê (Studienorientierung))

## Pêwîstî

Eger tu dixwazî ku li Almanyayê perwerdehiyê bibînî te hewcetî bi bawernameya têketina zanîngehê heye. Eger te Abitur'a almanî tuneye, divê vekolînî ku gelo tu dikarî bi bawernameya welatên xwe li Almanyayê perwerdehiyê bibînî an na.

Tu dikarî lêzanînên pirtir li ser malpera Anabin, li portala Lêzanînan a "Anerkennung in Deutschland" û li Deutschen Akademischen Austauschdienst (DAAD)bibînî.

Her wiha tu divê hin şehediyan derbarê serdestiya tam li ser (Asta ziman a C1) raber bikî, wek mînak TestDaF, DSH oder telc Deutsch C1 Hochschule.
Her wiha derfeta dabînkirina bûceyê bi riya Şêwirîna Perwerdehiyê ya Sindoqa Garantiya zanîngehê heye.
Hin zanîngeh her wiha demsalên seretayî raber dikin ku tu li wir almanî jî fêr dibî.
Tu dikarî lêzanînên zêdetir rasterast ji zanîngeha xwe werbigirî. Pirraniya zanîngehan xizmetên Şêwirînê di vî warî da raber dikin. Ji kerema xwe bala xwe bide ser moletên ku tu dikarî di wan jibo peyakirina rêya xwe ya perwerdehiyê bikevî tevgerê jî!

## Nebûna belgeyên têketina zanîngehê

Eger tu dikarî ku bi bawernameya Perwerddehiya xwe li welatê xwe perwerdehiyê bibînî, lê ne li Almanyayê, renge bikarî bi riya Zankoya Seretayî (Studienkolleg) biçî zanîngehê. Li wir daxwazkerên derveyî bi awayekî taybet jibo perwerdehiya li zanîngehê an zankoya taybet li Almanyayê amade dibin.

### Qonaxên perwerdehiyê

### Qonaxa perwerdehiya pêkan

## Karzanî (Bachelor)

Heyama perwerdejiyê herîkêm ji 6 heta 8 nîvsalan (3 heta 4 sal) e. Tu yê numreyên xwedêbergiravî ECTS'ê bi riya kurs û ezmûnên cûrbicûr kom bikî. Jibo wergirtina bawernameya Karzaniyê, divê te têra xwe not hebin û  Tezeke Karzaniyê binivîsî.

## Karzaniya Bilind (Master)

Qonaxa Karzaniya bilind (Master) Perwerdehiya Bilind piştî qonaxa Karzaniyê ye. Di qonaxa masterê da, naverok û lêhûrbûn zzêdetir ji qonaxa Karzaniyê ye. Ev kurs ji 4 heta 8 nîvsalan (2 heta 3 salan) dem dibe.

## Ezmûna seranserî (Ezmûna dewletî)

Çiqên (rişteyên) perwerdehiyê, wek mînak Bijîşkî, Maf, Dermansazî û hin çiqên Pîşeyên Xwarinê û çiqên perwerdehiya mamosteyan bi ezmûneke seranserî an xwedêbergiravî Ezmûna Dewletî tên kemilandin.

## Doktorî (Promotion)

Ji bilî çend babetan, Doktorî (Doktora) pêşmerca pîşeyeke pratîkî ye. Beriya bidawîhatina vê kursê, divê Teza Doktorayê binivîsî.

## Dabînkirina aborî ya perwerdehiyê

Wek xwendevanek (Student), tu dikarî bi riya Qanûna Alîkariya perwerdehiyê ya federal li Almanyayê piştgiriya aborî bi dest bînî (bi awayekî kurt: BaföG). Dyînên BaföG'ê bi awayê mehane û di rewşa herî baş da di heyama dewreya perwerdehiyê da pêk tê. Mehaneya BaföG'ê dikare ji 399 heta 735 Euroyî be. Nîvê pereyê BaföG'ê divê piştî qedandina perwerdehiyê were vegerandin. Lêzanînên deqîq derbarê BaföG'ê berdewam diguherin û loma tu dikarî bi riya lînka jêrê wan bi dest bînî:

💻 Malpera BaföG'ê jibo penaber û koçberan

Wek dewsgirek jibo BaföG'ê, tu dikarî jibo Bûrsiyeya perwerdehiyê (Scholarships) daxwaz bidî. Berovajiya BaföG'ê, Bûrsiyeya perwerdehiyê bi giştî nabe were vegerandin. Notên baş û soza dilxwazî roleke girîng di vê padaşê da heye. Qasa wê bi heman şêwaza bihayê BaföG'ê tê hesabkirin. Ji bilî viya, xwedîbergiravî "Pereyê Pirtûkan" tê dayîn, her mehê heta 300 Euroyî.

Rêxistinên ku bûrsiyeya perwerdehiyê didin, pirranî wek rêxistinên piştgir ên aborî tên naskirin. Rêxistinên jêrê jibo pêşketina xwendevanên bi feraset hin bernameyan bi taybet jibo penaberan raber dikin. Destûrkar û pêwîstiyên bernameyê dikarî li malperên jêrê bi dest bixî.

💻 Friedrich-Ebert-Stiftung (FES) – Bûrsiyeya perwerdehiyê (Scholarships) jibo penaberan

💻 Böckler-Aktion Bildung der Hans-Böckler-Stiftung

💻 Konrad-Adenauer-Stiftung (KAS) - Bûrsiyeya perwerdehiyê (Scholarships) jibo penaberan

💻 Villigst -  Bûrsiyeya perwerdehiyê (Scholarships) jibo penaberan

💻 Brot für die Welt -  Bûrsiyeya perwerdehiyê (Scholarships) jibo penaberan

Wek mînak, sindoqa Garantiyê ya Binyada Otto Benecke'yê istîsna ye. Ev bername jibo koçberên xort ku dixwazin bawernameya perwerdehiya xwe ya bilind ji Almanyayê werbigirin, jibo perwerdehiya li zanîngehê amade dibin û jibo pîşeyeka zanîngehê hewil didin, hatiye berçavgirtin. Ji bilî vê, bûrsiyeya perwerdehiya Almanyayê jî bi 300 Euro di mehê da piştevaniya aborî dike. Bûrsiyeyên Perwerdehiyê yên Almanyayê ji aliyê zanîngehên têkildar va tên raberkirin.

💻 Sindoqa Garantiya Zanîngehê ya Binyada Otto Benecke'yê li Bonn'ê

💻 Bûrsiyeya perwerdehiyê (Scholarships) ya Almanyayê: Bibe xwediyê Bûrsiyeya Perwerdehiyê

Tu dikarî lêzanînên zêdetir li malpera Însiyatîva zanîngehî jibo penaberan û Binkeya lêzanînan a Wezareta Perwerdehî û Lêkolînan a Federal (BMBF) bi dest bînî.

💻 Malpera Însiyatîva zanîngehî jibo penaberan

💻 Binkeya lêzanînan a Pêşniyarên Bûrsiyeyê (Rêbera Bûrsiyeya Perwerdehiyê BMBF)

### Şêwirîn û peydakirina riya Perwerdehiyê (Studienorientierung)

Kîjan çiqa perwerdehiyê jibo te guncan e û li gorî pisportî û hez û meylên te ye? Kîjan zanîngeh jibo te guncan e? Tu çawa mesrefên perwerdehiya xwe didî? Tu dikarî agahiyên zêdetir û Şêwirîna di vî warî da ji Ajansa Peydakirina Kar li cihê jiyana xwe bi dest bînî.

💻arbeitsagentur.de

Hema bêje li her zanîngehekê, navendeke Şêwirîna xwendevaniyê heye ku dikare bersiva têkildarî perwerdehiyê bide. Eger di dema niha da pirsine te yên taybet derbarê mijareke pisporî hene, divê serdana Xizmetên Şêwirîna pisporî ya zanîngehan bikî:

💻Fachhochschule Aachen
💻RWTH Aachen
💻Hochschule Bochum
💻Ruhr-Universität Bochum
💻Universität Duisburg-Essen
💻Heinrich-Heine-Universität Düsseldorf
💻Hochschule Düsseldorf
💻Universität zu Köln
💻Fachhochschule Niederrhein (Krefeld / Mönchengladbach)
💻Hochschule Venlo

## Agahiyên din:

- Tu hez dikî di çi çiqekê da perwerdehiyê werbigirî? Hemî qonaxên Perwerdehiyê li rûpela "Hochschulschulkompass" li Nordrhein-Westfalen'ê: hochschulkompass.de
- Rêbera Perwerdehiyab fermî li Almanyayê: studienwahl.de
- Agahiyên pratîkî derbarê perwerdehî, dabînkirina aborî û BaföG'ê: studis-online.de
- Destpêkirina perwerdehiya zanîngehê: hochschulstart.de
- Agahî derbarê malê, karên aborî yên xwendevaniyê, Lêmiqatebûna ji zarokan, xwendevanên bi rewşên taybet: studentenwerke.de

- Agahî jibo Penaxwazan: study-in-germany.de

### Bifermînaskirina belgeyan

Eger dixwazî ku li zanîngehên Almanyayê perwerdehiyê bibînî, xwedêbergiravî te hewcetî bi "Belgeyên Têketina nav zanîngehê" heye. Ev belge, guwahiya bidawîanîna xwendingehê ye ku şert û mercên te jibo Perwerdehiyê dabîn dike. Li binkeyan agahiyan a  anabin, tu dikarî vekolînî ku gelo bawernameya te bi tamî wek Belgeya derbasbûna nav zanîngehê li Almanyayê bi fermî tê naskirin an na. Biryardana derbarê derbasbûna bo zanîngehê jivo almaniyan, kesên derveyî an kesên bêyî mafê welatîbûnê, daxwazkerên belgeyên têketina zanîngehên derveyî li ber destê zanîngehan e.

**Agahiyên din:**

Ofîsa navendî ya Perwerdehiya Derveyî (ZAB)
Sekreterxaneya Konferansa Wezareta çandê
Graurheindorfer Straße 157, 53117 Bonn (Postfach 2240, 53012 Bonn)
kmk.org/zab
0228/501664
Email: zabservice@kmk.org

Demên axaftina bi telefonê, Duşemî, sêşemî û Pêncşemiyê ji saet 09:00 - 12:00 û 14:00 - 15:00; rojên Îniyê ji saet 09:00 - 12:00

### Guwahiya pisportiya zimanê almanî

Piraniya zanîngeh û zankoyên pisporî jibo perwerdehiyê hewcetî biAsta zimanî ya C1 hene. Ji kerema xwe jibo pirsên pirtir, rasterast digel zanîngehê bikeve têkiliyê. Hin zanîngeh her wiha kursên giştdemî û heyamkurt yên zimanê almanî jibo xwendevanan raber dikin.